Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :696 22-Îlûn- 2019 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Jin pênaseya aboriyê vedgerîne cewherê wê yê rasteqîn

Şoreşa Rojava ku wek “şoreşa jinan” tê naskirin, dikeve sala xwe ya 8‘emîn. Jinan di warê aboriya ku civakê esas digire de gavên girîng avêtin. Di vê çarçoveyê de gelek proje ku karî rê li ber keysbaziyê bigire û hewcedariya civakê bi cih bîne, pêk anîn û ji bo demên pêş jî bernameyeke projeyan danîn.





“Ekonomî” têgeheke yewnanî ye ku tê wateya “aboriya malbatê” anku “aboriya malê” û rêbaza jiyana malbatê û çawaniya peydakirina debara wê diyar dike.

Şoreşa Rojavayê Kurdistanê jî bingeha xwe ji felsefeya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan werdigire. Ew jî aboriyê wek pêkanîna pêwîstiyên madî yên girîng ji civakê re pênase dike.

Ji vî bingehî jinan dest bi lêgerîna rêbazên vegera aboriyê li cewherê wê yê rasteqîn kir ku aboriya komînal esas digire.

Avakirina sîstema aborî ya nû di gelek pêvajoyan re derbas bû û di avakirina wê de gelek zehmetî hatin dîtin. Nemaze ku ev sîstemeke tam ji cewherê xwe yê mîna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pênase dike, hatibû derxistin.

Bi pêvajoya şoreşa Rojava anku şoreşa jinan re, jinan gava yekemîn a ji bo pêşxistina aboriyê li gorî cewherê wê yê rast ji komînan dest pê kir ku bibe aktora sereke ya avakirina civaka demokratîk.

**ABORIYA JINAN BERIYA ŞOREŞÊ**

Beriya şoreşa Rojava ya 19`ê Tîrmeha 2012`an, rola jinan sînordar bû. Jinan tenê karên malê bi rê ve dibirin. Vê rewşê jî derfet nedida ku rola xwe ya dîrokî di nava civakê de pêk bînin.

**GAVA YEKEMÎN**

Yekitiya Star (Kongreya Star) wek pêngava yekemîn a ji bo pêşxistina aboriya jinan dest bi avakirina komînên jinan kir. Ji wê derê dest bi avakirina komîteyên aborî, wek yek ji bingehên sereke yên komînê ne, kir. Ev pêngav bingeha sereke ji bo aboriya jinan di nava şoreşa Rojava de bû.

Di vê çarçoveyê de gava yekemîn a şoreşa Rojava; birêxistinkirin û perwerdekirina jinan, pênasekirina wan bi nasname û rola wan a avakirina civakê bû. Li ser vê yekê Kongreya Star (berê navê wê Yekitiya Star bû) li hemû gund û bajaran dest bi avakirina komîn û meclisên taybet ên jinan kir. Di heman demê de, bi 10 jinan dest bi perwerdekirina jinan a di hemû aliyên jiyanê de û bi taybet di aliyê aborî de kir.

Bi ragihandina rêveberiyên xweser li kantonên Efrîn, Kobanê û Cizîrê re di sala 2014`an de, Desteya Jinan di nava rêveberiyê de hat avakirin. Desteyê projeyên aborî yên jinan girtin ser xwe da ku geşkirina aboriya jinan ji wê dest pê bike.

**XEWN BÛN RASTÎ**

Di navbera salên 2015-2016`an de jinan yekemîn projeyên aborî pêk anîn.Yekitiya Star piştî rêzecivînên bi jinan re dest bi yekemîn projeya çandiniyê kir.

4 hezar jin ku ji aliyê komîn û meclisan ve hatin hilbijartin, tev li vê projeyê bûn. Jinan di vê projeyê de 55 hezar donim genim, ceh û nîsk li kantona Cizîrê çandin, her wiha dest bi projeya xwedîkirina sewalan û çandina şênkayiyê kir.

**GAVEK BI PÊŞ DE**

Navenda Aboriya Jinan bi armanca berfirehkirina çalakiyên jinan di aliyê aborî de, yekemîn konferansa jinan di 15`ê Hezîrana 2017`an de li Bakurê Sûriyê li kantona Cizîrê li dar xist. Di konferansê de girîngiya avakirina aborî di rewşên şer, pêvajoya heyî de û girîngiya aboriya xweser ji bo şikandina ambargoya ku hatibû ferzkirin, hatin nîqaşkirin.

Di konferansê de gelek biryar hatin dayîn. Ji wan avakirina Koordînasyona Aboriya Jinan li Bakurê Sûriyê, avakirina akademiyeke perwerdeya aborî û vekirina navenda lêkolîn û pêşxistina aborî. Dîsan jî biryar hate dayîn ku pisporên di aliyê aborî de werin gihandin. Ew jî ku hemû jinên pispor ên di kooperatîfan de werin perwerdekirin û endam perwerdeyê der barê têgîna rast a koopratîfan û xebatên wê de bibînin.

Di konferansê de her wiha biryara firehkirin û aktîfkirina koopratîfên çandinî, pîşeyî, bazirganî û xwedîkirina sewalan hat dayîn û alavên çandiniyê ji koopratîfên çandiniyê re werin peydakirin û çalakî û xebatên destkariyê yên jinan werin pêşxistin. Konferansê giringî da koopratîfên herêmî yên biçûk û xebatên ji bo pêşxistina destkariyên jinan.

**JI ROJAVA BER BI BAKURÊ SÛRIYÊ VE**

Pêşxistina aboriya jinan tenê li herêmên Rojava sînordar nema. Li tevahî herêmên rizgarkirî yên Bakurê Sûriyê yên mîna Reqa, Tebqa, Dêrazor û Minbicê belav bû.

Kongreya Star dest bi birêxistinkirina jinan li herêmên ji çeteyên DAIŞ`ê hatin rizgarkirin, kir. Di destpêkê de û piştî 4 salan ji dagirkeriya çeteyên DAIŞ`ê û tirsa ku di nava jinan de çandibû, gelek zehmetî dîtin.

Lê piştî perwerdekirin û birêxistinkirinê jinên Ereb li Til Hemîs û Til Birakê bi serkêşiya Komîteya Aboriya Jinan dest bi rêveberiya şitilgehan û vekirina dikanên cilan kir.

Li Minbicê jinan xwaringeha Rebî (Bihar) a xwarinên gelêrî, cihê xwedîkirina mirîşkan û baxçeyên mêwanan vekirin.

Li Reqayê projeya tevnan li herêma Hezîma hat vekirin.

Komîteya Jinan a Meclisa Sivîl a Reqayê dest da aboriya jinan û baxçeyên sergirtî li herêma Reqa Simra bi firehiya 10 doniman vekirin. Her wiha firneyên pasteyan jî vekirin.

Li herêma Dêrazorê jî ku herî dawî hat rizgarkirin, werşeyên dirûtinê ji bo jinan vekirin.

**PROJEYÊN KU JINAN DIXIN SÛKÊN KAR**

Komîteya Aborî ya Jinan di sala derbasbûyî de alîkarî da ku Sûka Pepûle, her wiha xwaringeha Sêmalka, Çarçela li Dêrikê, xwaringeha Amargî li Kobanê, kargeha Fisûl (Werz) ya xwarinên di qûtiyan de li kantona Hesekê, qehwexaneya Amara li Rimêlanê û werşeyên dirûtinê li Qamişlo û Hesekê werin vekirin.

Li kêleka van jî beriya 4 salan, 4 hezar darên fêkî li kantona Hesekê û 3 hezar dar li Tirbespiyê hatin çandin. Ev dar dê sala bê berhem bidin û berhemên wan li hundirê welat werin belavkirin.

Aboriya jinan destekê dide rêxistinên taybet û saziyên rêveberiyê

Komîteya Aboriya Jinan alîkarî pêşkêşî jinên di rêxistinan û saziyên Rêveberiya Xweser de kir û rêyên serkeftina projeyên taybet ji bo jinên bî diyar kirin.

Ji bo jinên Efrînê piştî ku di gelek kargeh, werşên dirûnkariyê û projeyên biçûk de dixebitîn, piştî dagirkirina kantona Efrînê , niha karê xwe li kantona Şehbayê di kargeha ava vexwarinê û werşên dirûnkariyê de li kampan didomînin.

**KARKERÊN JI ALIYÊ JINAN VE TÊN BIRÊVEBIRIN**

Navenda Aboriya Jinan piştî ku alavên ji dervayî Rojava anîn da ku baş parastin û depokirina madeyan bike, dikaribû gelek projeyan pêk bîne.

Gelek kargeh hatin vekirin, ev kargeh jinên ji Efrînê û Helebê ku tecrubeya wan berê tê de hebû, bi rê ve dibin û niha bi dehan jinan li ser van alavan perwerde dikin.

Serkeftina hundirîn bala welatên cuda dikişîne

Serkeftina aborî li Rojava û Bakurê Sûriyê hişt ku gelek şandeyên ji derveyî welat mîna Brîtanya û Îtalyayê werin û alîkariyê pêşkêşî gelek projeyan bikin, jê kargeha dirûtinê ya li kampa Holê.

**PROJEYÊN SALA 2019’AN**

Komîteya Aboriya Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê amadekariya Festîvala Genim dike ku dê di dawiya meha Îlonê de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk were.

Her wiha planeke din a çandiniyê ji bo zeviyên ku şewitîne, heye. Tê payîn ku malbatên pispor di warê çandinî û xwedîkirina sewalan de vê projeyê bi rê ve bibin.

Her wiha komîte hewl dide 2 kargehan veke, yek a tevnan û ya din ji bo pêdiviyên malan e.

Her wiha amadekariya vekirina sûka jinan li Amûdê jî tê kirin.

Komîte plana çandiniyên din ji bo berhemên vê salê ku şewitîne, daniye. Ji bo sala bê jî amadekarî têne kirin.

**AMADEKARIYA AKADEMIYEKE NÛ**

Li aliyekî din jî amadekariya vekirina akademiyekê li Tirbespiyê li kêleka zeviyên ji bo çandiniyê hatin diyarkirin, tê kirin da ku endamên akademiyê werin perwerdekirin.



Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 696 22-Îlûn- 2019 Rojnameya Siyasî û Çandî


## Bi milyonan xwendekar ji bo avhewayê dadikevin qadan




Xwendekar ji bo avhewayê li qada navneteweyî dikevin grevê û çalakiyan dikin.*R-2*

# ‘TECRÎDKIRINA OCALAN ÇARESERKIRINA QIRÎZAN ASTENG DIKE’

Tevî ku Rêber Abdullah Ocalan ragihand ku dikare gelek qirîzên li Rojhilata Navîn di demeke kurt de çareser bike jî, lê hîna jî tecrîda girankirî li ser Ocalan berdewam e.



### LI DIJI SIYASETA TECRÎDÊ BERTEKÊN GEL ZÊDE DIBIN

***Dewleta*** Tirk tevî daxwazên gel a rakirina tecrîdê, ferzkirina siyaseta tecrîdê li dijî Rêber Abdullah Ocalan ji salan ve didomîne. Bertekên gel û derdorên fermî li dijî siyaseta tecrîdê berdewam in. Hevserokê Meclisa Herêma Efrînê Mihemed Naso têkildarî babetê wiha got: “Rêber Ocalan di nameya xwe ya dawîn de diyar kir ku amade ye pirsgirêkên girêkok çareser bike. Her wiha ji ferzkirina tecrîdê tê zanîn ku israrkirin di kûrkirina aloziyan de heye. Tecrîda li ser Ocalan ne tenê kesayeta wî dike hedef, lê belê tevahî gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn dike armanc.”

### BI MILYONAN GEL JI BO AZADIYA OCALAN BANG DIKIN

***Girêdayî*** mijarê, rêveberê Dibistana Şehîd Kendal a gundê Til Qirah Mihemed Elî Reşîd ku berê bi Rêber Ocalan re rûniştiye, wiha got: “Dewleta Tirk nahêle malbat û parêzerên Rêber Ocalan pê re hevdîtinan pêk bînin. Her wiha jî tecrîdê bi hedefa jidûrxistina çareserkirina pirsgirêkên li Rojhilata Navîn, ferz dike. Li gorî zagonan tu mafê dewleteke tune ye ku tecrîdê li ser kesekî ferz bike. Bi milyonan gel li ser rêç û felsefeya Rêber Ocalan dimeşe, da ku azadiya rêber Ocalan mîsoger bike û Efrînê ji destê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê rizgar bike, di nava têkoşînê de ye.” ***R-5***

## Aloziya navbera PDK û YNK’ê mezin dibe




Nakokiyên navbera PDK û YNK’ê her carê bi rengekî cuda xwe nîşan didin. Yek ji rêveberên YNK’ê mahmûd Sengawî xwest ku biçe Hewlêrê, lê belê asayîşa PDK’ê nehişt ku Sengawî bikeve nava bajêr. Li dijî avahiya PDK’ê jî êrîşeke çekdarî pêk hat. ***R-2***

## Ji ber vetoya Çîn û Rûsyayê agirbest li Idlibê nepêkan e

Ji ber ku Çînê û Rûsyayê li Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî veto kirin, ihtimala agirbestê ya li Idlibê ji holê rabû. Her wiha welatên Rojavayî jî îdîa kirin ku armanca wan astengkirina krîza însanî bû. ***R-2***





## El-Qeftan: Em bi gumanin ku aloziya Sûriyê bê çareserkirin

***Serokê*** Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Ibrahîm El-Qeftan got: “Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji civînên ji bo danûstandinên çareseriya aloziya Sûriyê tên dûrxistin. Bi vî awayî ne gengaz e ku aloziya Sûriyê çareser bibe.” ***R-4***



## Nûjîn Yûsif: Wê vîna jinan cîhaneke demokratîk ava bike

***Endama*** Rêveberiya Nivîsgeha Jin a MSD’ê Nûjîn Yûsif di derbarê tundiya li ser jinê û bandora netew dewlet li ser jin nirxand û got: “Netew dewlet bi zîhniyeta desthilatdaran hatiye avakirin, cihê ku dewlet lê hebe demokrasî û îradeya jinan fetisî dimînê, em di wê baweriyê de ne ku wê vîna jinan cîhaneke aram û demokratîk ava bike.” ***R-3***



## Êlên Ereb: Îdiayên dewleta Tirk derew in

***Rûspiyên*** êlên Ereb îdeayên dewleta Tirk ên ku dibêje, êlên Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştevaniya wan dikin, derewandin û gotin: “Hemû êl bi QSD’ê re ne û li dijî gefên Tirkiyê ne.” ***R-5***

Loriya dayîka min
Sîpan ŞÎNDA R-7

Serkeftin tekûz şansê ...
Idrîs HENAN R-5

# Aloziya navbera PDK û YNK'ê mezin dibe

**Nakokiyên navbera PDK û YNK'ê her carê bi rengekî cuda xwe nîşan didin. Yek ji rêveberên YNK'ê mahmûd Sengawî xwest ku biçe Hewlêrê, lê belê asayîşa PDK'ê nehişt ku Sengawî bikeve nava bajêr. Li dijî avahiya PDK'ê jî êrîşeke çekdarî pêk hat.**




Vê yekê YNK gelekî aciz kir. Ji rêveberên YNK'ê Pawel Talabanî, Lahor Şêx Cengî Talabanî, endamên Komîteya Navendî ya YNK'ê, rûspiyên eşîrên Çîmen Çemçemal, Germiyanê nerazîbûna xwe ya ji ber astengkirina serdana Sengawî eşkere kirin.

Alîkarê Yekemîn ê Sekreterê YNK'ê Kosret Alî Resûl jî nameyek ji Serokê Giştî yê PDK'ê Mesûd Barzanî re nivîsî ku tê de nerazîbûna li dijî vê rewşê vegot. Piştî ku aloziya ji ber vê bûyerê di navbera YNK û PDK'ê rû da êvarê li dijî Serokatiya PDK'ê ya li Bajarê Silêmaniyeyê êrîşeke çekdarî hate kirin. Piştî ku pêşmergeyên li ber avahiya PDK'ê bûn bersiv dan demeke kurt şer qewimî. Heta serê sibehê li hin deverên Silêmaniyeyê dengê çekan dihate bihîstin.

PDK'ê der barê mijarê de daxuyaniyek weşand û YNK ji êrîşê berpirsyar nîşan da. YNK'ê jî diyar kir ku ji wesayitekê fîşek hatiye berdan û ji bo tespîtkirina wesayitê û yên di wesayitê de karên wan didomin.

# Bi milyonan xwendekar ji bo avhewayê dadikevin qadan




Çalakiyan li Pasîfîk û Awûstralyayê dest pê kirin. Tê payin ku çalakiyên bên kirin çalakiyên herî girseyî yên heta niha bûne.

Li Awûstralyayê bi deh hezaran xwendekar xwe amade dikin ku di serî de li Sydney û Melbourneyê li gelek bajaran dakevin qadan.

Li gelemperiya dinyayê wê li 156 welatan zêdeyî 5 hezar çalakî bên kirin û tê payin ku bi milyonan xwendekar li hev kom bibin.

Tê texmînkirin ku li New Yorkê 1,1 milyon xwendekar dersan boykot bikin û tevlî xwepêşandanan bibin.

Kampanya Fridays for Future ku xwendekara Swêdî Greta Thunberg pêşengiyê jê re dike, dixwaze zarokan li tevahiya dinyayê daxîne qadan û bikin ku yên mezin bikevin nava liv û tevgerê. Thunberg a 16 salî Çarşemê bang li kongreya Emerîkayê kiribû û gotibû, "Dixwazim ku hûn guh bidin zanyaran. Dixwazim ku hûn li dora zanistiyê bibin yek. Piştre jî bi rengekî rasteqîn bikevin nava liv û tevgerê."



## Koalîsyona Erebî "çalakiya leşkerî" li bakurê Hudeydayê ragihand

Li gorî toreya El-Erebiye ku Koalîsyona Erebî ragihand ku wan di operasyona leşkerî de 4 cihên komkirin û mayînkirina keştiyan ji dûr ve û mayinên deryayî teqandin. Li gorî kaolîsyonê ku ev yek dê aramiya azadiya navîgasyona deryayî û bazirganiya cîhanê li başûrê Deryaya Sor, mîsoger bike.

Her wiha teqez kir ku çalakiya leşkerî li gorî zagonên navneteweyî tê meşandin û hemû tedbîrên pêwîst girtine.

Koalîsyonê ragihand ku keştiya bombebarkirî ku Hûsiyan ji Hudeydayê şand, pêşî lê hate girtin û rûxandin.

Berdevkê fermî yê hêzên koalîsyonê Tirkî El-Malikî wiha got: "Sîstema hêzên deryayî ya koalîsyonê duh hewldana Hûsiyan ên girêdayî Îranê ku bi karekî dijminatî û terorê li başûrê Deryaya Sor bi rêya keştiya bombebarkirî pêk dianî, çavdêr kirin."El-Malikî da xuyakirin ku ew keştiya bombebarkirî ku gef li ewlehiya herêmî û navneteweyî û rêyên çûn û hatinê yên deryayî û bazirganiya cîhanî xwarin, hate rûxandin.

# Ji ber vetoya Çîn û Rûsyayê agirbest li Idlibê nepêkan e



Ji dema destpêkirina şerê navxweyî yê li Sûriyeyê û vir ve hejmara pêşnûmeyên ku Rûsyayê li Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî veto kiriye gihîşt 13 pêşnûmeyan. Rûsyayê mafê xwe yê vetoyê herî dawî li dijî pêşnûmeya banga agirbestê ya li Idlibê bi kar anî.

Ji endamên demkî yên Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî Elmanya, Belçîka û Qûweytê pêşnûme amade kirin û ji aliyê 12 welatan ve hate qebûlkirin. Di dengdanê de ji endamên demkî Gîneya Ekvatorê helwesteke bêalî nîşan da û Rûsya û Çînê mafê xwe yê vetoyê bi kar anîn. Bi vî rengî pêşnûme nehate qebûlkirin.

Yên ku pêşnûme amade kirin hişyar kirin ku şerê li Idlibê wê bibe sedema 'krîzeke mezin a însanî' û Rûsyayê jî diyar kir, operasyonên tên kirin beşek ji 'têkoşîna li dijî terorîzmê' ye. Rûsyayê dixwest, 'operasyonên li dijî terorîzmê' li derveyî pêşnûmeyê bê hiştin. Lê belê ev daxwaz ji aliyê welatên din ve hate redkirin.

## Ji 2050'î wê 200 milyon mirov hewceyî alîkariyê bin



Di raporê de ya ku Xaça Sor a Navnetewî û Federasyona Rêxistinên Heyva Sor (IFCR) dayî ber Neteweyên Yekbûyî (NY) berdêla giran a ji ber sedema tevnegerîna li djî germbûna global hate nirxandin.

Di raporê de ya bi navê ''The Cost of Doing Nothing -Berdêla tiştek nekirinê'' hate gotin ber bi sala 2050'î ve her sal hijmara mirovên ku wê hewceyî alîkariyê bibin  zêde bibe û 2050'î bibe 200 milyon.

Di raporê de hate diyarkirin şape, bager, ziwabûn û şewatên li daristanan rasterast bandorê li sedan milyon mirovî dikin û jiber van rûdanên sirûştî û mirovî 108 milyon mirov hewcehiya alîkariya mirovî ya navnetewî ne.

Di raporê de hate destnîşankirin heke ti tevdîr neyê standin 20130'î ev hijmar wê bibe 150 milyon û 2050'î jî 200 milyon mirov wê hewceyî alîkariyê bin.

Di raporê de hate diyarkirin niha donorên navnetewî ji bo alîkariya mirovî salê di navbeyna 3 û 11 milyar Euro de fonê çêdikin û ev reqem 2030'î herî kêm wê 18 milyar doalr be. Di raporê de hate gotin îhtîmal heye ku dibe ku hewcehiya darayî ya ku wê zêde bibe neyê peydakirin jî.



# Ji bo pêşxistina xebatên çandî rewşenbîr dixebitin

**Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîran a Şaxê Qamişlo Hûda Şêxmûs diyar kir ku, bi armanca pêşxistina xebatên çandî û çareserkirina pirsgirêkên di vî alî de, ew her sal civîna xwe lidardixin.**

*Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo*



Çawa gel hewcedarê xwarin û vexwarinê ye, ewqasî hewcedrê pêşxistina kar û xebatên çandî ne. Ji ber ku her civakek bi çanda xwe têne naskirin, gel di çi rewşê de be çanda xwe wenda nake û her dem hewil didin ku çanda xwe pêşbixe. Li Qamişlo bi armanca pêşxistina çanda civakê Yekîtiya Rewşenbîran di Meha Îlonê de civîna xwe ya salane lidarxist. Di civînê de kar û xebatê salekê yê yekîtiyê hat nirxandin, ji bo pêşxistin û çareserkirina pirsgirêkan nîqaş hat kirin û pîlansazî hat dayîn.

**DI CIVÎNÊ DE JI BO PŞÊXISITNÊ GELEK GOTÛBÊJ HAT KIRIN**

Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîran a Şaxê Qamişlo Hûda Şêxmûs diyar kir ku, pêşxistina karê çandî civakê jî pêşdixe û got; ev sal jî weke hemû salan civîna Yekîtiyê ji bo pêşxisitna kar hat lidarxisitin, ev civîn bi regnê rêxistinî bû. Di civînê de gelek gotûbêj hat kirin lê ya bingehîn li ser rewşa çandî ya herêmê bû. Herwiha li ser rewş, pêşketin û bilindkirina asta her endam û şaxên yekîtiyê ya herêma Cizîrê hat nirxandin. Yekîtiyê di civînê de bal kişand ser vê xalê, ji bo pirsgirêkên salên borî dûbare nebe, me pîlansazî çêkir.

**HER SAL ÇALAKIYÊN ÇANDÎ ZÊDETIR DIBE**

Hûda di dewama axaftina xwe de bal kişand ser çalakiyên çandî, îsal çalakî zêdetir bûn û got; piştî destpêkirina şoreşa Rojava derfetê gel çêbû ku çanda xwe pêşbixin, lewra çalakiyên çandî sal bi sal zêdetir dibe. Ji ber vê yekê em wekî rewşenbîrên herêmê, tiştê ku li qadê çêdibe, li gorî wê em xebatên xwe didin meşandin. Di heman damê de tevlîbûna ciwana jî di xebatê çandî de geveke başe, ji ber bi tevlîbûna wan di yekîtiyê de fikir, pênûs û rûyên nû çêdibe.

**PILANSAZÎ Û PÊŞNIYARÊN YEKÎTIYÊ**

Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîran Hûda Şêxmûs di dawiya axaftina xwe de behsa pîlansaziyên sala nû kir,  ji bo kar û xebatê çandî hîn bêtir pêşbikeve pîlansaziya salekê diyar kir û got; pîlansaziya Yekîtiya Rewşenbîran ji bo sala nû wiha ye.

Yek: Lidarxistina mihrîcana Helbestvan Ceger xwîn.

Du: Bi armanca pêşxistina û bilindkirina asta çandê, wê serdana hemû yekîtiyên rewşenbîran yên herêmên Rêveberiya Xweser a Rojava -Bakur û Rojhilatê Sûriyê were kirin.

Sisê: Ji bo xurtkirina moral, her ji demekê wê Yekîtiya Rewşenbîra ya herêma Cizîrê serdana şaxên din yê yekîtiyê bikin ta ku çalakîyekî çandî li ser sê mehan lidarbixin.

# Pirtûkeke newaze: Alîkariya Destpêkê

Pirtûka bi navê 'Alîkariya Destpêkê' ya bijîşk Erdal Sîpan a nû ji bo xebatkarên tenduristiyê û her wiha ji bo xwendekarên beşa alîkariya destpêkê berhemeke newaze ye.


Pirtûka 'Alîkariya Destpêkê' ya bijîşk Erdal Sîpan ji nav Weşanên Sîtavê derçû.

Li ser mijara alîkariya destpêkê ya tenduristiyê cara yekem e ku pirtûkeke bi zaravayê kurmancî tê çapkirin. Sîpan di pirtûka xwe de hemû pêdiviyên alîkariya destpêkê nirxandine û bi zimanekî zelal mijar bi wêneyên rengîn raxistine ber xwendevanan. Wêneyên wê ji aliyê Ercan Altuntaş ve hatine çêkirin.

Tê payîn pirtûk ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Herêma Federal a Kurdistanê, Rojhilat û derveyî welat re jî bê şandin.

Dr. Erdal Sîpan der barê pirtûka xwe de ji Ajansa Mezopotamyayê re axivî. Sîpan anî ziman ku di warê qada tenduristiyê de bi kurdî berhem pir kêm in û di vî warî de pêdiviyek pir zêde bi pirtûkeke wiha hebû. Sîpan got: "Bi taybetî jî bi zimanekî hêsan û fêmkar hewce bû berhem werin çêkirin û nivîs werin lêkirin. Bi taybet jî tenduristî ji bo her kesî mijareke girîng e û divê her kes ji bo tenduristiyê xwedî hîn zanînan be."

Sîpan diyar kir ku û wî gelek pirtûk di vê mijarê de dane ber hev û got: "Lê min li gorî xweseriya gelê Kurd û Kurdistanê ev pirtûk lêkir. Her tim rewşên birîndar û nexweşînê derdikevin pêşiya me. Ji welatên din bêtir ev tişt li welatê me diqewimin. Ji bo rewşeke wiha ji bo em bikarin pêşiya tiştên nexweş bigirin, lazim bû ev pirtûk were derxistin. Hewce bû bi zimanê dayikê em vê pirtûkê biweşînin. Ev pirtûk




ji bo her kesî pêdivî ye. Ji heft saliyan bigire heta heftê saliyan dikarin ji vê pirtûkê sûd werbigirin. Zimanê wê zelal e. Me di dawiya pirtûkê de jî peyvên tibî wek ferhengok nivîsandiye."

# Ji bo bîranîna ş. Rênas ku bi xwe jî ji kedkarên Rojnameya Ronahî bû ye.

*Firat YILDIRIM*



ÇIYAYÎ  ME
Çiyayî me çiyayî
Car li dîlana azadiyê xêlî me
Car di şikefteke sar de
Hestiyên termekî rizî me…

Ev dol û newal
Gav bi gav dewsên lingên  min
ên xwas dinasin
Ev berf û bahoz
Ev mij û dûman û toz
Sehînc bi sehînc
Şopa tiliyên min dinasin…

Ev sir û seqem
Ev qeşa û berçem
Teht bi teht
Qerimînên qedemên min dinasin…

Ev asîman
Ewr bi ewr
Awirên min ên arî dinasin…

Çiya yî me çiyayî
Betonên bajar û metropolan
Nikarin min bihewînin…

Divê ez erd û axê
Divê berf û baranê
Divê lehî û tavê
Divê stêrk û heyvê bibînim
Û hîs bikim…

Divê bi bayê dar û daristanan
Divê bi bêhna gul, nêrgiz û sosinan
Bişom serçavên xwe…

Çiyayî me çiyayî
Rojan raman gerim
Şevan rêwî me
Û çeka min
Nîvê bedena min
Şirîkê temenê min
Ey rêhevala min
Min gelekî ji te hez kir…

Çiyayî me çiyayî
Lewma
Bêhna axê tê ji laşê min
Lewma
Tama axê tê ji peyvên min
De êdî nebêje min were
Tu here û venegere
Çiyayî me ez
Nikarim werim
Dema ji vir dûr bikevim
Bizane êdî rêwî me ez…



## Loriya dayîka min

Sîpan ŞÎNDA

Loriya te bû giyan berda li ser wî kelexê min ê kiçik û nesebiqî di wî betnê te yê ji hemû kelehan û hêsaran ewletir ji bo min. Loriya te bû hêlîna jîna min. Dema ew galgala te dihat guhên min, aram dibû hemî êş û janên laşê min. Ew loriyên ji wî dengê te yî melûl derdiketin bûn derman û narqoza janên min yên ku nedihêlan hedarî li min bikeve û xew biçe çavê min. Ele eleyên te bûn ji bilûr û mey û lîr û kemanan bandorkartir û di wê bêhedamiya min de weke sêhrê ez noqî kûrahiyên xewa şêrîn dikirim. Ne şirobên bijîşkan, ne derziyên hemşîran bû ez ji wan nexweşiyên giran û yên bêmical radikirim; ew hembêza te ya ji hemû nexweşxanan bi ewletir û ew loriyên te yên ji hemî stranên hozanan nermtir û xweşiktir bûn dermanê êşa min. Erê ew deng û loriyên te bûn, bê wan hedar û tebata min nedihat û çavên min nediketin ser hev ji bêyî wan. Tu bûyî serdarê hemî hozanan ji bo min. Dengê ewan gewlazên gûz û behîv û moriyên te bi destên xwe hûnandîn û bi mehdika min ve dikirin bûn ji hemû enstrûmanan xweşiktir ji bo min. Ne dengê kemanê, ne ji yê fîq û neyê, ne yê lîrê û ne ji yê bilûra serzenda wan enstrûmanan hemiyan bû weke dengê wan gewlaz û loriyên te xweşik û melîl. Belê ew bazbendên bi gulîvand yên te bi tiliyên lingên xwe digirt û bi dest û tiliyên xwe yên zêrîn dihûnandin û landika min ve dikirin û ez pê girêdidam di wê dergûşê de û ez dispartim wan bûn ji hemû xwedî û leşkeran bi ewletir. Ji ber kû te bi wan loriyên xwe yên nazenîn ew dergûş û bazbend şîret dikirin û qewitiya parastina min li wan dikir, te ez bi wan hiçik girêdidam û ez dispartim wan û ber bi xewa şêrîn ve hêdî hêdî rêdikirm. Payîzûk û serêliyên te bûn ez mest dikirim di wê dergûşê de. Ew mehdika zêrîn a te bi wî dilê xwe yî şewat bi risim kirî û kezeba xwe bi wê re parve kirî. Ew dergûşa bi wan loriyên te hatî terbiye kirin bû ez hembêz dikirim bi dilovanî û melûliya loriyên te. Ew landik bû ji min re ji hemû qesr û qonaxan xweştir; lê ya ew dergûş ji min re dikir qesra xweşiktirîn ya li ser rûyê gerdûnê dîsa ew loriyên te bûn. Nema disekinî giriyê min û ez di nav tirs û xofê de bûm dema ez ji wan loriyên te bêpar dimam; çawa dengê loriyên te yên melîl li ber guhê min diketin tirs direvî, birçî bûn ji bîra min diçû. Belê dengê te yî melûl û loriyên te yên mestar bûn ku min ji  nav hemû deng û qerebalixê de ew bi yek derbê de nasdikirin; ji ber kû ew ji bo min notayên cîhanê yên herî xurt û cuda bûn. Erê loriyên te bûn di wê hembêza te de ez afirandim xwedawenda min.

# Kaniyên xwezayî feydê didin Çiyayê Kizwanan

Ji 3 deverên Çiyayê Kizwanan jêdarka jiyanê kaniyên xwezayî, pêdiviyên gundiyan bi cih tînin. Dayika bi navê Emîna Xilêf a ku feydê ji kaniyên xwezayî yên jêderka jiyanê digire wiha got: “Em û lawirên xwe gelekî sûd ji ava kaniyê digirin. Bi saya kaniyên xwezayî em gelek pêdiviyên xwe bi cih tînin.”



Li Çiyayê Kizwanan ê li Başûrê Navçeya Til Temirê dikeve, gelek tiştên balkêş û dîrokî hene. Yek ji van tiştên balkêş û dîrokî ava kaniyên Çiyayê Kizwanan e. Ava van kanîna di nava çol û çiya û newalan re derbas dibe û digihêje gundan. Ev kanî di 3 deverên Gundê Xera re tê der. Dayika bi navê Emîna Xilêf ku bi xwe ji gundê Xerayê ye, ji Ajansa JINNEWS’ê re behsa sûda ji kaniyan digire kir.

**‘KANIYÊN AVÊ, PIRSGIRÊKÊN ME ÇARESER DIKIN’**

Emîneyê di destpêkê de diyar kir ku wan berê pir pirsgirêka avê jiyane û wiha dom kir:”Piraniya gundê Çiyayê Kizwanan pirsgirêka peydakirina ava şêrîn a vexwarinê jiyane. Ji ber di serdema rejîmê de ava şêrîn tune bû û guh nedidan vê herêmê. Lê piştî Şaredariya Gel hate avakirin û kaniyên avê çêbûn, pirsgirêka me çareser bûn.”

**‘DÎROKÊ XWE DI ÇIYAYÊ KIZWANAN DE VEŞARTIYE’**

Emîneyê wiha dewam kir: “Di Çiyayê Kizwanan de gelek deverên dîrokî û tiştên balkêş hene. Mîna Kelha Sukera û Mexlûca û şikeftên ku dîroka wan vedigere hezarê salan berî û piştî zayînê. Tiştê balkêş ew e ku di sala borî de ji Çiyayê Kizwanan av ji 3 deveran bi dîrokên cuda, bi rengê kaniyan hat der. Dîrok xwe di Çiyayê Kizwanan de veşartiye. Ew kanî jî ne mezin e biçûk e, lê hemû pêdiviyên gundiyan bi cih tîne. Kanî dûrî gund e, di nava newalan de ye, zarok û jin ji wir heya gund ku bi 10km dimeşin carnan jî hildikişin ser kerê û diçin avê tînin mala xwe.”

**‘KANÎ MÛCÎZEYEKE DÎROKÎ YE’**

Emîneyê di dawiyê de kêfxweşiya xwe anî ziman û wiha got:”Em û lawirên xwe gelekî sûd ji ava kaniyê digirin. Bi saya kaniyên xwezayî em gelek pêdiviyên xwe bi cih tînin. Ev kanî cihê kêfxweşî û dilşadiyê ye. Ji ava kaniyê him ji vexwarin, him jî ji paqijiyê û ji lawiran re jî dibe. Vebûna kaniyê pir balkêş bû ji me re mîna mûcîzeyeke ango derhozeyeke dîrokî ye. Di cîhanê de pir tiştên balkêş hene mînaka wê jî ev kaniyê ku di çiya de dertê.”

# Sala nû ya perwerdê destpêkir

**Nalîn YÛNIS/ Ronahî Qamişlo**



Ji ber ku ziman nasnameya civakê ye, pêwîstî li xwedî derketina wê heye. Li Rojava Bakur û Rojhilatê Sûriyê sala nû ya perwerdê destpêkir. Piştî demekê ji şoreşa Rojava li dibistanan guhrtinên ber çav hatin dîtin û gavên mezin hatin avêtin. Cara yekê ku li Sûriyê sîstema pewerdeyê li gorî neteweya demokratîk û zimanên pêkhateyên herêmê pêk tê. Zimanên ku li dibistana tê dayîn wiha ye: Kurdî, erebî, suryanî û îngilîzî.


**JI BO PÊŞXISTINA ZIMAN HER SAL GUHERTIN ÇÊDIBE**

Berdevka Dibistana Seretayî ya ``Mûsa Bin Nisêr`` Nisrîn Cento li ser vekirina dibistanan û guhrtinên sîstema perwerdê wiha got: “Ev demeke ji bo sala nû ya perwerdê amadekarî tê kirin, ji ber ku rola ziman di civakê de girînge pêwste sal bi sal em vî zimanê pêşbixînin. Her sal guhertin di sîstema perwerdê de çêdibe, guhertina ku îsal çêbû ye, veqetandina refê 6`an ji dibistanên seretayî. Ji ber ku biranşên refa 6`an li ser xwendekaran girane, Desteya Perwerdê ew tevlî dibistanên navîn kirin. Li dibstanên seretayî ji refa 1 heta 3 biranşê wan wiha ye: Ziman, bîrkarî, civak, werzîş, wênesazî û mûzîke. Refa 4 heman biranşa zanyarî tê zêdekirin û refa 5 jî îngilîzî. Dibistanê seat 8`an destpêdike heta 1 nîvro bi dawî dibe. Hejmarê mamosteyan 29`in û hîn jî pêdiviyên me bi momasteyan heya, hejmarê xwendekarin jî 273 û hê jî tomarkirina navê xwendekaran berdewame.”

**YÊ KU CIVAK BI RIH DIKE ZIMANÊ DAYÎKÊ YE**

Li ser heman mijarê Berdevkê Dibistana Navîn ya ``Mehmûd Esaid`` Ciwan El-Elî wiha axivî: Di destpêkê de dixwazim bêjim, sala nû ya perwerdê destpêkir, em bi hêvîne ev sal wekî hemû salan bi serkeftî derbas bibe. Ji bo pêşxistina ziman û têghiştina xwendekaran, îsal desteyê refa 6`an tevlî dibistanên navîn kirin. Li dibistanê xwendekar biranşê







bîrkarî, dîrok, fîzîk, zanyarî û çand û exlq dibînin. Hejmarê wan jî 600`in û yê mamosta 35`in. Ji ber ku hejmara herî mezin ji xwendekaran yê Qamişlo li vê dibistanê ye, em hinekî astengiya dikşînin. Yek jê selikê qirêjê, çaksazkirina refan, avayîya dîwarên dibistanê yê ku ji ber kolandina xindeqan xirabûn û dawiyê de daxwazîk min heya, ez wekî berdevkê dibistanê pêşinyar dikim ku basek ji basê gel, mamosteyan bînin dibistan, ji ber ku aliyê çûn û hatinê, mamoste zehmetiyan dibînin.”

**JI BO REFA 11`AN AMADEKARÎ HATE KIRIN**

Di dawiyê de Berdevkê Dibistanên Amadeyî ya``Erebstan`` Kawa Hisên diyar kir ku ev demeke ji bo xwendekarên amadeyî mamoste têne perwerdekirin, bi taybetî ji bo refa 11’an û got; ji ber ku fêrkirina xwendekarên bi vî temenî ne tiştekî hesane, Desteya Perwerde û Fêrkirinê li ser biranşên refa 11`an di bêhinvedana havînê de mamoste tevlî perwerda kirin. Par em derbasî dibistanên amadeyî refa 10’an bûn, îsal jî em drbasî refa 11’an bûn, ji bo wê ev demeke amadekarî tê kirin. Li dibistan û biranş ser du beşan tê daîn beşê Edebî û Zanistî. Biranşê edebî wiha ye: Erdîngarî, ziman, dîrok, felsefe û jinolojiya ne. Biranşê zanistî jî bîrkarî, fîzîk, kîmiya û zanyarî. Li gorî xwesteka xwendekaran, tevlî yan beşê zanistî yan jî edebî dibin. Hejmarê xwendekaran heta niha gihiştiye 170`ê û yê mamoste 18`ne.

# Ji pirsgirêka çopê re çareseriyên bi tendurust

**Sîsin Çiya/Ronahî Qamişlo**


Li hember şewitandina çopê di bajarê Qamişlo de, ku bi taybet di saatên êvara de pêk tê, gel bi gazincin. Rojnameya me him li gazincên gel guhdar kir, him jî ev gazincana ji rêveberiya şaredariya bajarê Qamişlo re ragihand.


Serokê komîna Ş.Xebat Hesen Ebbas Yûsif yek ji welatiyên taxa Hilîliyê milê rojhilat e. Ji bo pirsgirêka çopê Rotko û xeterî û ziyanên ku li gel dibe got; dûmana ji çopê Rotko derdikeve, gelek ziyan bi zarok, jin û kalan dikin.

Hesen rewşa welatiyekî ji taxa Hilîliyê bi me re parve kir: “ji ber her roj di dema berêvarî de agir bi çopê dixin, kalemêrek bi navê Mihemed Şefîq Şêx Mûsa Hecî Osê yê 85 salî beriya bi deh rojan niştekariya dil çêkiribû, doh ji ber bihna çopê bihna wî çikiya û bi empulansê birin Şamê. Em weke gelê Hilîliyê daxwaza çareseriyekê ji vê rewşê re dikin. Hêvîdarim şaredariya me bi erk û berpirsyariya xwe rabe.”

Welatiyê bi navê Ehmedê Gulo yê ji taxa Hilîliyê milê xerbî rewşa cihê çopê Rotiko wiha nirxand: “Ev cih berê ne cihê çopê bû lê ji ber ev der cihê kurdan bû, rêjîmê çop xistin nav çavên me û kesên qabûl nekirine xistin zindanê. Ji salên 90`î û vir ve ev cih bûye cihê zibalê, ruxmî ku ev cih ya avên vexwerinê ye; tê de nêzî 60 bîrên avê hene. Herwiha rojane nexweşî û gilî û gazinên gel pir dibin.” Ehmed di dawî de got ez hêvî dikim ku şaredariya me vê pirsgirêkê çareser bike.

Endamê Komîteya Ekolojî yê Kantona Qsmişlo Tariq Mihemed





wiha bersiv da gazincên gel: “ji bo pirsgirêka çopê Rotko, serî de em rexnedayîna xwe didin ku heya niha ev pirsgirêk bê çare maye. jixwe beriya niha bi 10 salan ev kombûna çopê çêbûye, rojane nêzî 60`î tonî çop ji Qamişlo û gundên wê derdikevin.” Tariq ji bo çareseriya pirsgirêka çopê Rotko û gumaniya ku ziyan gihabe avê an na nirxand: “Rastî ev pirsgirêk ne piçûke, lewra me komîtek lêkolînê ava kir û rewş bi giştî şopand û me rewşa lezgîn ragihand. Ji bo pirsgirêka çopê û kêmkirina ziyanê me sehrîcên avê û amûra vemrandina agir xistin maliyetê. Li gorî birêkirina lêkolînên ku Desteya Şaredariyê ji me re kiriye, biqasî 100 heya 120 hezar çargoşe erd ji bo xistina çopê û nêzî 30/40 hezar çargoşe ax jî wê li ser were belav kirin. Lê Ji bo gumana ku ziyan gihiştibe avê an na, me bi riya raghandina cîhanî tehlîl ji bo hemû bîrên avê çêkirin, ti pirsgirêk tine bûn. Herwiha ji bo dema pêş ziyan çênebe û ev pisgirêk çareser bibe, hin tedbîr hatine girtin.”



# `Bi pêşengtiya jin ewê PYD bibe hêza çareseriyê `

Berdevka Meclîsa Jin a PYD`ê Sîlvan Elî 16` mîn salvegera PYD`ê li gelê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pîroz kir û got: “Wê ev sal bi pêşengtiya jinê bibe hêza çareserkirina aloziya Suriyê û bikeve xizmeta tevayî gelên sûriye yê” .



**Sîsin Çiya/Ronahî Qamişlo**

Berdevka Meclîsa Jin a PYD`ê Sîlvan Elî ji bo salvegera 16`mîn PYD`ê wiha got : “ Em 16`mîn salvegera PYD`ê li gelê herêmên Bakur û Rojhilatê Suriyê pîroz dikin. PYD`ê ne tenê ji bo rêxistinkirina gelê kurd e, rêxistinkirina civakê tevayî digire ser milê xwe. Wê ev sal bi pêşengtiya jinê bibe hêza çareserkirina aloziya Suriyê û bikeve xizmeta gelên Suriyê “ .

Sîlvan wiha balkişand ser xebata 16 salan:” Bê guman PYD `ê di van 16 salan de gavên pir girîng avêtin. Nemaze jinê xwe di milên siyasî, rêxistinî, dîplomasî de jî îspat kir û di qadên Navnetewî de muxatib hat girtin”.

**‘DI SISTEMA NETEWEYA DEMOKRATÎK DE JIN DIGHÊJE TEVAYÎ MAFÊN XWE’**

Sîlvan ser bingeha avakirina PYD`ê û rola wê wiha nirxand: “ PYD`ê wek partî ser esasê Netewa Demokratîk û hevseroktiyê ava bû. Lewra rola jinê di qadan tevan de heye. Her wiha rola wê yekemîn ew e ku rêxistinkirina xwe di nav beşên civakê tevan de ava bike û jin jî karibe siyaseta xwe rast temsîl bike, ji bo ev siyaset bikeve xizmeta civakê. Ruximî ku PYD `ê gavên pir girîng avêtin ji bo jin bikaribe mohra xwe li dîrokê bide lê pêwîstî bi karek berfirehtir heye,. Ji ber di nava sîstema kapîtalîst de rol, îrade û mafê jinê hatibû tine kirin ango jin ne ayîdê xwe bû û ew madeyên bi navê wê derketine xuya kir ku nav a jinê ye, lê piratîka wê ya zilam e. lê wek sîstema Netewa Demokratîk jinê mafê xwe bi hemû awayan digire û rola xwe bi îrade di qadan tevan de dilîze”.

**JIN BI HEMLEYEKE NU XWE GIHANDIN GELEK DEVERAN**

Sîlvan ser rêxistinkirina jin û pêşveçûna wê wiha domand : “ Li kêleka rêxistina hevsroktî di nav PYD`ê de rêxistina xweser jî hat ava kirin. Em Karin bêjin rêjeya jinê di hundir PYD `ê de ji % 60 e. rêxistina jinê di sê pêvajoyan re derbas bû; Destpêkê jinê wek rêxistin xwe da pêş pişt re Ofîsên xwe ava kirin û nêzî salekê ye Kongira jin hat li darxistin, tê de karê jinê berfirehtir bû. Lewre navê wê hat guhartin ji Ofîsa jin bû Meclîsa jin. “

Sîlvan wiha domand : “ ji ber kêmaniyên me ji bo gihandina civakê tevayî derket, me hemleyek berfireh dest pê kir û hewldanên me ji bo gihandina herêmên rizgarkirî wek (Şedad, Cerablus, Til Hemîs) dest pê kir, me civînên berfireh li wan herêman li darxistin. Em karin bêjin ji % 50 ev hemle bi ser ketin û piştî Kongirê li gor biryarên ku werin girtin emê hemleyên xwe berdewam bikin”.

Berdevka Meclîsa Jin a PYD`ê Sîlvan Elî ji bo dema pêş wiha bidawî kir:” Sedsala 21`an sedsalek dîrokî ye, em di pêvajoyek pir hestiyar re derbas dibin. Pêwîstî bigirtina biryarên rast û cidî tê de esasgirtina rola jinê heye, ji ber ew dikare pêşroja civaka xwe diyar bike. Siyasetek qirêj ser civakê û bitaybet ser jinê tê meşandin. Lewre bangewaziya meji jinan tevan re xwe bi rêxistin bikin û yekîtîya xwe ava bikin.”

# Nûjîn Yûsif: Wê vîna jinan cîhaneke demokratîk ava bike



Yek ji sedema bingehîn a kuştin û tundiya li ser jin, mêjiyê netew dewletê ye. Di van salên dawiyê de tundiya li ser jinan zêde bûye. Li dijî jinan bi her awayê tundî tê kirin. Jin di qadên siyaset û aboriyê de li paş maye û mafê wê hatiye xwarin. Her roj jin tên kuştin û qetilkirin û bi mexdûriyeta serdestiya civakê re rû bi rû dimînin. Helbet sedemên tundiyê jî tê ji hişmendiya sîstema netew dewletê ya desthilat, ku tenê di nêrîna wan de jin ji bo çêkirina zarokan dijî. Di têkildarê mijarê de Endama Rêveberiya Nivîsgeha Jin a Meclîsa Sûriyeya Demokratîk Nûjîn Yûsiv li ser tundiya li ser jinan û bandoriya netew dewletê li ser jin û civakan nirxandinên girîng kir û bersiva pirsên Ajansa JINNEWS’ê da.

-Hûn hebûna jinan ya di nava netew dewletê de çawa dinirxînin?

Têgeha demokrasiyê xwedî dewlemendiyeke cudaye. Dema ku mirov demokrasiyê pênase bike mirov nikare li kêleka wê netew dewletê bihizire. Di nava netew dewletê de tu cihek ji bo jinan tune ye, ji ber ku hişmendiya netew dewletê li ser mêjiyê serdestiyê hatiye avakirin û li gor zîhniyeta wan jin û mêr nabin wekhev. Di nava sîstema dewletê de her çiqas jinên siyasetmedar hebin jî , lê vîn û nêrîna van jinan tuneye, tenê jin bi bedena xwe li wir amadene. Di mêjiyê dewletê de jin weke meta tê dîtin û bikaranîn, ji bo wê jî dewletên hegomonîk ne heqiyê li jinan dikin, mînaka wê jî dewletên wekî Fransa û Tirkiyê xwe dewletên demokrasî dibînin, lê di rastiya xwe de tundiya herî mezin a li ser jinan tê kirin di van dewletan de ye. Em dikarin bêjin cihê ku dewlet lê hebe demokrasî fetisî dimînê.

-Tevger û saziyên jin yên heyî çima dibin hedefa netew dewletê?

Jiyan li ser dûbendiyan xwe didomînê. Em dikarin bêjin di nava mirovan de jî her tim dûbendî heye. Sîstemên heyî jî li ser geleg bingehan xwe damezrandine. Ger dewlet hebe, helbet wê dijbertiya wê jî were kirin, ji ber di nêrîna hêzên desthilatdar de divê nêrîn ji derveyî nêrîna wan tune be. Hêzên desthilatdar rêxistina jin ji bo xwe tehdîd dibînin û êrîşî jinan dikin, ji ber jin civakê li ser heskirin û wekheviyê birêxitin dike û li ser lingan dihêlê. Têkoşîna jina li hember van kiryaran didome . Em di wê baweriyê de ne ku wê vîna jinan cîhaneke aram ava bike.

-Li herêmên rizgarkirî hûn rewşa jinan çawa dinirxînin?

Li herêmên rizgarkirî rewşa jinan başe . Lê belê ev jin zehmetiyan di saziyên jinan yên birêxistinkirî de dibînin, ji ber bi sala ye ev jin di nava civakê de biçûk hatine xistin. Jin ji cewherê xwe hatibû dûrxistin û tu nirx û maf jêre ne hatibû dayîn. Sîstema BAAS jî weke her dewletên desthilatdar , heman zîhniyet li ser jinan dida meşandin û tu qîmet ne dida jinê ,da ku jin ne bin xwedî kesayetên azad. Li kêleka wê jî hişmendiya eşîran ne hiştiye ku jin pêşve biçin û her wan di nava koletiyê de hiştibûn. Li gor salên berê, niha mirov dikarê rewşa jinan bi rengekî erênî li ber çav bibînê û binirxînê.

-Jinên ku rastî şidetê tên divê çawa werin parastin û projên we ji bo wan çine?

Beriya her tiştî pêwîste civak ji aliyê zîhniyetê de were guhertin. Divê jin di aliyê parastina cewherî de xurt bibe. Jinên bê perwerde û parastin wê her tim bibin armanca êrîşan, ji bo wê jî esas perwerdekirina jinan girîng e. Li herêmên rizgarkirî ji bo jinan dadgeh hatina avakirin, li kêleka wê jî malên jin, meclisên jin, komînên xweser ji jinan re hatine vekirin. Jin dikarin bi rehetî doza mafê xwe bikin. Di heman demê de li van herêman ji bo guhertina hişmendiya mêr jî perwerde tên dayin da ku serdestiya mêr li ser jinan bi dawî bibe. Parastina herî guncav ji hebûn û nirxê jin re parastina cewheriye.

# ‘Divê zehmetiyên jiyanê nebin asteng’





Firyaz Îsa ku li bajarê Kobanê dijî, bi keda destê xwe debara malbata xwe bi rêve dibe. Zehmetiyên Firyaz yan malbatê pirin, keçeka wê 10 saliye û di heman demê de di dilê wê de kun heye. Hevjînê wê û xwesiya wê ji lal in. Firyaz bê rawestandin û bi rûyê xweyê bi ken barê zehmetiyên jiyanê li ser milê xwe sivik dike û di nava ked dayinê de ye.

Firyaz bê navber di her werzê salê de kardike û xwarinên zivistanê yên ku di taştêyan de tên xwarin çêdike û difroşe. Niha jî dema çêkirina pêdîviyên zivistanê ye. Firyaz bi Çêkirina xwarine Megdûse kedê didê, ev xwarin yek ji xwarinên bi nav û denge li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di payizan de tê çêkirin û ji zivistanê re tê hilandin û di dema taşteya siban de tê xwarin. Bêtirîn naskirina çêkirina vê xwarinê Firyazê ji Ajansa JINNEWS’ê re gotinên xwe bi dayina kedê parve kir.

**‘JIN DIKARIN JI BO ABORIYEKE BAŞ XWE PÊŞBIXIN’**

Firyaz wiha qala çêkirina xwarina Mekdûsan dike: “Megdûs xwarineke bi destê dayikan ji bo zivistanê tê çêkirin. Megdûs ji bajanên reş yên piçûk û nû derdikevin çêdibe. Destpêkê em bajana tînin û kelekê li ser agirê daran didinê de û paşê em demek di bin keviran de zûha dikin, da ku av di nava wan de nemîne. Dema amade dibe nava wan bi îsota sor û guwîz û fistiqan dadgirin. Paşê di nava yaxa zeytûnan de em dihilînin, wisa dimîne heye zivistan tê û em bi taşteyan re dixun. Xwarina Megdûsan di zivistan de pir xweşe. Dema baran dibarê û sibêhê zû be bi çayeke gerim re em dixun. Ev xwarin pir hesana û gelek mesref jî jêre nabê. Ev çanda herêma meye û her kes çêdike û jê hesdike.”



**‘BI KEDA DESTÊ XWE DEBARA JIYAN XWE DIKIM’**

Firyazê, balkişand li ser xweşiya xwarinên destê dayikan û wiha axaftina xwe domand: “Xwarinên ku bi destê dayikan tê çêkirin, ji yê kargehan xweştirin. Xwarinên me hemû xwezayine û em paqijiya wê berçav digirin. Dema ez van xwarina ji malbatên din re çêdikim, ez li xweşî û paqijjiya wê baldarim. Bi keda destê xwe ez debara jiyana xwe dikim.” Di dawiyê de Firyaz got: “Ez nahêlim ku zehmetên jiyanê bidin asteng li hember ked û vîna min ez ê xebat bikim û tim bi jiyanê re di nava xweşiyê de bim.”

# El-Qeftan: Em bi gumanin ku aloziya Sûriyê bê çareserkirin



Serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Ibrahîm El-Qeftan got: "Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji civînên ji bo danûstandinên çareseriya aloziya Sûriyê tên dûrxistin. Bi vî awayî ne gengaz e ku aloziya Sûriyê çareser bibe."

Serokê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Ibrahîm El-Qeftan di hevdîtineke bi Ajansa ANHA'yê re diyar kir ku guhertinek di xîtaba "Dewletên Garantor" yên di lûtkeya dawîn de çêbûye.
El- Qeftan got: "Ev lûtke di paytexta Tirkiyê Enqereyê de roja Duşema borî bi tevlibûna serokên Rûsya, Îran û Tirkiyê li dar ket. Niha berê xwe dane xetek nû ew jî mijara komîteya destûrî li Cinevê ye. Ev tê wateya vegera xeta rastîn a biryara navneteweyî bi hejmara 2254 yanî vedigere hemêzkerê xwe yê bingehîn."
Ji aliyekî din ve siyasetên dûrxistina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji qadên navdewletî û danûstandinê ku ji bo vedîtina  çareseriya aloziya Sûriyê li dar dikevin berdewam in. Digel wê El-Qeftan gumanên xwe yên girêdayî serkeftina wan civînan ên ku nûnertiya sûriyan nakin rave kir.
Di berdewama hevdîtinê de El-Qeftan got: "Gelo aliyên Sûriyê wê bertekê nîşanî wan dewletan bikin? Ev dewlet bi xwe pirsgirêk in, ne ku çarseriya pirsgirêkê ne. Tirkiyê bi  kiryarên xwe yên li herêma Efrînê û xwedîderketina li hêzên terorîst re, bûye pirsgirêk."
El-Qeftan pêwîstiya tevlikirina sûriyan di çareseriya aloziyên ku welatê wan ji 2011`an ve tê re derbas dibe tekez kir.
El-Qeftan ev tişt li gotinên xwe zêde kir: "Eger şêniyên Sûriyê yên ku bi yekîtiya Sûriyê bawer in, beşdarî danûstandinan nebin, di vir de ez behsa şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikim, çareserî ne pêkan e. Parêzgeha Idlibê  rastî şerên dijwar ên di navbera hêzên rejîma Sûriyê, hevalbendên wê û komên çeteyên ku Tirkiye desteka wan dike, ve tê.  Li gorî van şeran em hêvîdarin ku çareserî bê rijandina xwînê çareser bibe."
El-Qeftan destnîşan kir ku Tirkiyê doza paneberên sûrî bi kar tîne û bi wê jî şantajê li Ewrupayê dike, da ku desteka ewropî di dosyayên ku dikevin xizmeta timayên serokkomarê Tirkiyê Receb Tayyîp Erdogan yên dagirkerî de, bi dest bixe.
El-Qeftan bixêrhatina vegera penaberên sûrî kir û wiha got: "Ev jî bi yek şertî tê pejirandin. Divê ev xizmeta guhertina demokrafîk ku AKP  plan dike ku wek Împeratoriya Osmanî bike, neke."

# 'Tu civîn beyî nunerên Rêveberiya Xweser nabe çareserî'

**Bêrîvan ÇIYA/ Ronahî Heseke**

Rojnameya me bi serokê ofîsa rêxistinî a partiya Sûriya pêşeroj li herêma cizîrê D.Salih Zobee re hevpeyvîneke li ser mijarên weke herêma ewle û rêkeftina di navbera Hevpeymana netewî û Hêzên Sûriya Demokratîk û Tirkiyê de li ser vê herêmê, şerê li Idlibê, civîna Cinêf, amadekariya destûra sûriyê û bi giştî pêşketinên siyasî û eskerî li meydana sûriyê, pêkanî.

**-Kantona Hesekê bû şahidê pîrozbahiyek girseyî ji aliyê partiya sûriya pêşeroj ve,bi hazirbûna hezaran ji nişteciyên herêma cizîrê ,çi name hate dayîn?**

Pîrozbahiya girseyî ya ku ji hêla Partiya Sûriya Pêşeroj ve li kantona Hesekê hate li darxistin, peyama serkeftinê bû ku gelê me li bakur û rojhilatê Sûriyê bi dest xistin û   bidestxistina ewlehî û aramî ji bo herêmên  me û dûrkirina şer û wêrankirinê, ji ber gefên Tirkî û ragihanda şer li deverên bakur û rojhilatê Sûriyê dihate kirin, gelên herêmê jî bi vîna xwe helwest li hember van gefan nîşan da. Pîrozbahî ji bo sekna gelê me yê berxwedêr bû.

**-Li gel peymana li ser herêma bi ewle, gefên Tirkîyê li bakurê Sûrîyê berdewam dikin, hun vêna çawa dinirxînin?**

Tirkiyê gelek qirîzên siyasî û aborî jiyan dike û îdia dike ku kirîzaTirkiyê ji hêla çavkaniyên derve an ji welatên cîran ve ye, û her wiha opozîsyona  çekdarî ya ku wî piştgirya wê dikir di Sûriyê de. Ji bo ku rûyê xwe biparêze, bi riya medya gefan li ser bakur û rojhilatê Sûriyê dixwe. Ev gotinên bê wate ne. sozek ji koalîsyona navneteweyî heye da ku pêşî li şer li bakur û rojhilatê Sûriyê bigire. Bi van gefan re, ew hewl dide ku li hin herêmên din hin feydeyan bi dest bixe, îdîa dike ku şer hîna didome, ji ber ku ew hewl dide bi gefxwarinê li Ewropa dike bi penaberên Sûrî, Penaberên sûrî bi darê zorê vegerîne Sûriyê.

**-Bi dijwariya bombebarana Rûsya û rejîma Sûrî li ser deverên Idlib, gelo çi sînaryo ji bo Idlibê hatiye amadekirin?**

Bi firehkirina nakokiya di navbera hêzên li ser qada Sûrî û rêkeftina damezrandina herêmek ewle li bakur û rojhilatê Sûriye, Rûsya û rejîma Sûriye şerê xwe li deverên Idlibê di bin pêşengiya şerê dijî terorê de, tund kir. Tevî hebûna peymanên Astana û deverên kêmkirina tansiyonê di navbera Rûsya, Iran û Tirkiyê de. Rûsya hewl dide ku Idlibê sererast bike û ji nûve rehabîlîtasyona rejîma Sûriyê bike. Bazirganiyek di navbera Tirkiye, Rusya û rejima Sûriyê de heye,Tirkiyê fesîleyên ku piştgiriya  wan dikir hişt û bi vî rengî karta dawî li Idlibê wenda kir. Gelê li Idlibê ev kiryarên dewleta Tirk û xapandina wan ji gelê Sûriyê re fêm kirin.

**-Tê gotin di qonaxa bê de civînek li Cinêvê û nivîsandina destûreke nû ya Sûrî heye. Gotina we ji bo wê çi ye?**

Çi civîn an kongir ji bo çareserkirina kirîza Sûrî li Cinefê an li devereke din, bêyî beşdarbûna nûnerên xweseriya demokratîk dê nikaribe qeyrana Sûriyê çareser bike. Beşdariya rêveberiyê an Meclisa Sûriya Demokrat di



van civîn û kongiran de gava pêşî a çareseriyê ye, Ji ber ku ew di çareseriya de hejmara herî dijwar e û xwedî rolek mezin di qada siyasî û leşkerî ya Sûrî de ye, divê nûnerên bakur û rojhilatê Sûriyê di amadekirina her destûreke nû de bin ku mafên hemû gel û pêkhateyên Sûriyê û civakên wê misoger bike.Gotinên ku ji hêla rayedarên hêzên navneteweyî ve hatine pejirandin, Divê nûnerên Meclisa Sûriya Demokratîk di civînên pêş de beşdar bibin.

# 'Ji bo çareseriyê divê şer bi dawî bibe'



Dayikên Laçikspî bi daxwaza "Dayik aştiyê dixwazin' di 17'ê îlonê de li ber avahiya AKP'ê ya Amedê xwestin çalakiya rûniştinê li dar bixin. Bi çalakiya dayikan bi dehan maşîneyên polîsan hatin li ber avahiya AKP'ê û dora AKP'ê dorpêç kirin, nehiştin ku çapemenî dîmen bikeşînin. Dayikên Laçikspî ji hêla polîsan ve hatin derpkirin û binçavkirin. 4 dayikên ku di dema binçavkirinê de bi heqaretê re rûbirû man. Dayikên ku di heman rojê de hatin berdan raporên tenduristiyê girtin. Di rapora ku hatî girtin de tiliyê Dayika Laçikspî Nazîme Yurek hatiye şikandin û pişta wê jî reş bûye. Dayika Laçikspî Aysel Tufan ji ajansa me re qala armanca çalakiya xwe kir.

**'DEWLET JI GUNEHÊN XWE NIKARE RIZGAR BIBE'**

Aysel jî di dema binçavkirinê de hatiye derpkirin û wiha dest bi axaftina xwe kir: "Dewlet HDP'ê hedef nîşan dide. Lê bi vî şeklî nikare xwe ji gunehên xwe rizgar bike. Dewlet bi xwe jî dizane ku muxatap ev bi xwe ye. Li bajarên din malbat kom kirine û anîne li ber avahiya HDP'ê.  HDP'ê dê çî bike? Nahêlin ku HDP'ê li meclîsê siyasetê bike. Derbarê her gotinê HDP'ê de lêpirsin tê vekirin û hedef tên nîşandan. Ji bo ev pirsgirêk bê çareserkirin HDP'ê çû meclîsê lê nahêlin ku pirsgirêk bê çareserkirin. Kesên ku nahêlin pirsgirêk çareser bibe îktîdara AKP û MHP'ê ye. Kê û kî dixapînin. Kesek nikare me bixwapîne. Em hestiyên zarokên xwe dixwazin. Em zarokên xwe yên li girtîgehê dixwazin."

**'EM AŞTÎ Û ARAMIYÊ DIXWAZIN'**

Aysel, destnîşan kir ku naxwazin kesek jiyana xwe ji dest bide û wiha bilêv kir: "Em naxwazin gerîla, ciwan, leşker, polîs jiyana xwe ji dest bidin. Bi salane li dijî kuştin û mirinan hewl didin û daxwazên xwe tînin ziman. Lê heta îro dewletê guh nedaye daxwazên me. Malbat li ber ber HDP'ê rûniştine, li benda çareseriyê ne. Lê cihê rûniştinê ne HDP'yê, AKP'ye. Her wiha dayikên ku çûn li ber AKP'ê jî hatin derpkirin û li erdê hatin kaş kirin. Çima? Ji ber ku em aramî û aştiyê daxwazin em rastî êrîşê hatin."

**'HEQARET LI DAYIKAN KIRIN Û DAYIK HATIN DERPKIRIN'**

Aysel, qala çûyîna xwe ya li ber avahiya AKP'ê wiha anî ziman: "Dema em çûn li ber avahiya AKP'ê kesek tunebû û me li ber derî dest bi çalakiya rûniştinê kir. Kesên berpirsê ewlehiyê bûn û li ber derî hatibûn bi cih kirin li hemberî me nesekînin. Lê ji ber ku helwestê nîşanê me nedan di heman deme de ji kar hatin dûrxistin. Polîs hatin li ber avahiyê û xwestin me ji avahiyê dûr bixin. Tiştek nepirsin û ji me re gotin 'Ev ne li cihê çalakiyê ye û em destûrê nadin. Hûn zarokên xwe naxwazin hûn dixwazin tevlîheviyê derxin. Biçin rewşa zarokên xwe ji Demîrtaş bipirsin' Êrîşe li me kirin û me sivarê maşîneyan kirin. Di nav maşîneyê de em hatin derpkirin û em bi heqaretê re rûbirû man."

**'KESEK NIKARE DAYIKTIYA ME LÊPIRSIN BIKE'**

Aysel, diyar kir ku kesek nikare dayiktiya me lêpirsin bike û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Divê di serî de her kes mirovatiya xwe li ber çavan derbas bike. Divê bizanin li hemberî dayikan dest nayê rakirin û ev şermeke mezin e. Divê malbat û dayikên li ber HDP'ê rûniştinê neyên lîstîkan. Bila rastiyê bibinin. Ji bo berjewendiyên xwe ev malbat tên bikaranîn û divê vî tiştî baş bizanin. Dema karê dewletê ji malbatan biqede silavek nadin wan û bila baweriya xwe ji çapemeniya alîgir neynin."

**'JI BO ÇARESERIYÊ DIVÊ ŞER BI DAWÎ BIBE'**

Dayika Laçikspî Aysel di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser çareseriyê û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Em dizanin çareserî dê çawa pêk bê. Bila ev malbat hinek bifikirin, dê HDP'ê çawa wan zarokan bîne. Heta ku dewlet destûr nede û rêyek veneke dê çawa bên. Dema ku zarokên wan bên jî dê dewlet ceza bide zarokan û dê zarokan bişîne girtîgehê. Bila kes kesî nexwapîne. Heke zarokên xwe dixwazin, divê di serî de şer bi dawî bibe. Divê devlet deriye Îmraliyê veke. Dê bi vî şeklî pirsgirêk  bê çareserkirin."



# 'Tecrîdkirina Ocalan çareserkirina qirîzan asteng dike'

Tevî ku rêber Abdullah Ocalan ragihand ku dikare gelek qirîzên li Rojhilata Navîn di demeke kurt de çareser bike jî, lê hîna jî tecrîda girankirî li ser Ocalan berdewam e. Gelek kesan diyar kir ku dewleta dagirker a Tirk li pêş çareserkirina aloziyan asteng e.



Dewleta Tirk tevî daxwazên gel a rakirina tecrîdê, ferzkirina siyaseta tecrîdê li dijî rêber Abdullah Ocalan ji salan ve didomîne. Bertekên gel û derdorên fermî li dijî siyaseta tecrîdê berdewam in. Ajansa ANHA'yê vana bertekana wiha rave dike:
Hevserokê Meclisa Herêma Efrînê Mihemed Naso têkildarî babetê wiha got: "Rêber Ocalan di nameya xwe ya dawîn de diyar kir ku amade ye pirsgirêkên girêkok çareser bike. Her wiha ji ferzkirina tecrîdê tê zanîn ku israrkirina kûrkirina aloziyan e."
Naso anî ziman ku tecrîda li ser Ocalan ne tenê kesayeta wî dike hedef, lê belê tevahî gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn dike armanc û wiha domand: "Tecrîda li dijî rêber Ocalan, tecrîda li ser tevahiya gel e. Lê belê gelê Kurd hêviya xwe qut nekiriye."
Naso wiha pê de çû: "Bi milyonan gel li ser rêç û felsefeya rêber Ocalan dimeşe, da ku azadiya rêber Ocalan mîsoger bike û Efrînê ji destê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê rizgar bike."
Di dawiya axaftina xwe de, Mihemed Naso tecrîda li dijî rêber Abdullah Ocalan şermezar kir û wiha got: "Li gorî zagonan tu mafê dewletekê tune ye ku tecrîdê li ser kesekî ferz bike."
Girêdayî mijarê, rêveberê Dibistana Şehîd Kendal a gundê Til Qirah Mihemed Elî Reşîd ku berê bi rêber Ocalan re rûniştiye, wiha got: "Dewleta Tirk nahêle malbat û parêzerên rêber pê re hevdîtinan pêk bînin. Her wiha jî tecrîdê bi hedefa jidûrxistina çareserkirina pirsgirêkên li Rojhilata Navîn, ferz dike."

# Êlên Ereb: Îdiayên dewleta Tirk derew in



Dewleta Tirk a dagirker bi hincet û bihaneyên derew, gefan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe. Dewleta dagirker dixwaze bi van hincetên derew herêmê dagir bike. Heman demê de, li herêmê siyaseta guhertina demografiyê û îmhakirina çandê dimeşîne. Armanc ew e ku herêmê bike nuqteya terorê û ji nûve rêxistinên tundraw biafirîne.
Serokê meclisa qebîleya Cebûr û endamê rûspiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Fewaz Zewbe derbarê gefên Tirkiyê de wiha got: "Ji destpêka aloziya Sûriyê ve, dagirkeriya Tirk hewl dide nearamî û tevlîheviyê li herêmê çêbike." Herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi cihêrengiya çand, etnîk û olan navdar e. Tevahî di rêveberiya herêmê de beşdar in û cihê xwe di Rêveberiya Xweser û meclisên herêmî de digirin. Zewbe di vê çarçoveyê de wiha axivî: "Berjewendiyên dewleta Tirk li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene. Dixwaze herêmê dagir bike û demografiya herêmê biguhere. Çawa ku niha li Efrîn, Bab, Ezaz û hwd… pêkaniye."
Zewbe derbarê îdîayên serokkomarê Tirkiyê Recep Teyyip Erdogan de ku dibêje, êlên Ereb ên Bakurê Sûriyê piştgiriyê didin wî, wiha axivî: "Ew ne wekîlê li ser êlên Ereb ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Êlên Ereb û Kurd hevgirtî ne û dagirkirina herêmê red dikin. Me herêmên xwe bi xwîna hezaran şehîdan rizgar kir. Ji bo parastina herêmên xwe, berdêlên giranbiha hatin dayîn. Em nahêlên ti kes tevliheviyê pêk bîne.  Ji ber armanca dagirkeriyê tevahî pêkhateyên herêmê ne."
Rûspiyê êla Cehêş û seroka meclisa rûspiyên bajarê Hesekê Abdullah Kondar diyar kir ku hedefa gefên Erdogan ew e ku  xewnên Osmaniyan ji nû ve vejîne û wiha got: "Dixwaze vê jî bi hinceta ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xeteriyê li ser ewlehiya nîştimanî ya Tirkiyê çêdikin, bike. Armanc dagirkirina herêmê ye. Tevî avakirina ewlehiya sînor, hê jî gefên dewleta Tirkiyê berdewam in. Gefên wê bi armanca tevliheviya aramiya herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, ne."
Kondar gotinên xwe wiha bi dawî kirin: "Pêkhateyên Ereb û tevahî êlên Ereb bi QSD'ê re ne. Ji ber ew hêza yekane ya ku parastina wan ji dagirkeriyê dike ye. Em îdîayên dewleta dagirker a Tirk, şermezar û lanet dikin."….*ANHA*

# Şahiya salvegera 16`an a damezirandina PYD`ê

Partiya Yekitiya Demokratîk salvegera 16`an a damerzirandina partiyê bi dirûşmeya `Bi giyana neteweya demokratîk em salvegera 16`an a damezirandina Partiya Yekîtiya Demokratîk vedijînin` hat pîrozkirin.
Bi hezaran  şêniyên herêma Dêrikê û çar navçeyên wê tevî endamên saziyên civaka sivîl, rûspiyên êlên Ereb, partiyên siyasî, şandeyek ji Rêveberiya Xweser, bi sedan ji şervanên YPG, YPJ û endamên Hêzên Ewlekariya Hundirîn (asayîş) beşdarî şahiyê bûn.
Di şahiyê de hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk Şahoz Hesen axivî û got: "Divê em bikevin ferqê ku îro bi saya fedekariyên gelê me û xwîna şehîdan em şahiyê li dar dixin.



Partiya Yekîtiya Demokratîk liser bingehek rast, bi saya fikr û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan ê ku bingehîn lêvegera gelêrî û zanistî li Rojava daniye, ava bû. Lewra gelê me xwe li ser vê bingehê di tevahiya waran de birêxistin kir."
Hesen wiha domand: "Partiya Yekîtiya Demokratîk rastî gelek êrîşên pergalên faşîst hat. Gelek endamên wê ji kadroyên partiyên ji hêla rejîma Sûriyê ve hatin girtin û çaranûsa hindek ji wan ne diyar e. Tevî ku gelek ji wan bi komployên li dijî kadroyên partiyê li hundir û derve şehîd bûn."
Hesen ev tişt li gotinên xwe zêde kir: "Armanca partiyê biratiya gelan di navbera pêkhate û mezheban de ye. Lewra partî amadeye bikeve diyalogê da ku vê pirsgirêkê care bibe û pergelek demokratîk ku xizmeta tevahiya gelan dike ava bibe."
Di dawiyê de Hesen got: "Em soza şopandina rêyan şehîdan didin. Bi vê boneyê em tevahiya şehîdên xwe di şexsê şehîd Şîlan, Fuad, Zekeriya, Cemîl, Bavê Cûdî, Osman, Îsa Hiso û heval Xelat a ku çaranûsa wê di girtîgehên rejîma Sûriyê de hîna ne diyar e bi bîr tînin. Tevî bi sedan ji hevalên ku rastî dijwartirîn cureyên îşkenceyê di girtîgehê rejîma Sûriyê de."
Hevseroka Partiya Yekîtiya Demokratîk Ayşe Hiso jî axivî û salvegera damezirandina partiyê ya 16`an pîroz kir.
Piştî bidawîbûna axaftinan, Koma Şehîd Alêna ji Rimêlanê, Koma Reseniya Govendê ya girêdayî Til Hemîsê, Koma Şehîd Rojbîn Ereb a ji Til Koçerê tevî Koma Botan a ji Qamişlo û Koma Cûdî ya ji Dêrikê stranên şoreşgerî di nav tilîliyên dayîkan de û berzkirina dirûşmeyên dilsoziya bi şehîdan re vegotin.

## FENER



### Serkeftin tekûz şansê têkoşîna gelan e

**Idrîs HENAN**

Ji rojên destpêkê ve gelên Sûriyê dibêjin ku; her kesî di bin navê me de mudexele kiriye û civînên cur be cur li dar dixe, lê kesekî jî ji bo me nekiriye. Her kesî ji bo berjewendiya xwe agirê li welêt vêketiye gur kiriye û li gorî xeyalên xwe alafa wê hêgin kiriye.
Ji rojên destpêkê ve vîna bizava gelêrî ya li Sûriyê hate desteserkirin. Bernameyên ecîndeyan lê hatin barkirin û ew bizav vala vala hate derxistin. Êdî ji tevgereke xwedî armancên azadî, demokrasî, wekhevî û edaletê tûşî çirava koletiyê û beşdarî nava şerê desthilatdariyê kirin. Ewrek reş di ser vî welatî re meşandin û çiqas kîn, nefret, kuştin, talanî, qirkirin û mirinên curbecur hebûn barandin. Ji lew re qetek ji rêveberên vê bizava han bû ezbenî, qetek reviya derve û qetek jî di bin navê çiqarên hundir û derve de bi awayên cur be cur mirin. Qeta mayî jî ya herî girîng e!. Ew jî beşa kurtêlxwaran e. Li ser destê wan dagirkerî xwe mayînde dike. Tevî vê yekî jî, tişta sosret ne ew e..? ecayîbên aloziya Sûriyê gelek in. Tevî vê rewşa aloz, herdu rikberên "ezben" ên hundir û derve ku beşdarî nava girêka kor a desthilatdariyê bûne, di bin ebeya welatparêziyê de xaka Sûriyê radestî faşîzmê dikin û dagirkeriyê rewa dikin. Li dijî projeya demokratîk a gelan şer dikin û bi desthilatdariya rejîma Baas re li hev dikin.
Ger mirov çavekî li nexşeya îro bixe, qey dibêje ku lebata 2011'an a li Deraa'yê ne li Sûriyê bû! Lîskek zarokên Deraa bû û bi hev ket?!. Nexşeya hêzê û encamên îro li ser erdî tekez dikin ku aliyên xwe li ser pişta tevgera gel bar kirine, ti nûnertiya vîna gel nekirine û ne jî dikin. Tenê li ber bayê faşîzmê semaya koletiya çors a bê mînak kirine. Çi ziman û çi gelên dîtir ên Sûriyê bin. Ji her aliyekî beşek têra xwe kurtêlxwarî û ajanatiya mutleq ji ecîndeyên derve re kiriye. Ji lew re ligel vê yekê, pir bi hêsanî û bê sinc şerê netewa xwe kirine û li dijî azadiya gelê xwe têkoşiyane. Li dijî projeyên azadî û demokrasiyê bi dagirkeriyê re êriş pêk anîne û xaka Sûriyê li ser tepsiyên zêrîn radestî faşîzmê kirine. Ji Helebê bigire û heya Bab, Cerablus, Ezaz, Efrîn, Idlib, Humus, Hema û gundewarên Şamê were. Maka bizavê jî Deraa radest kirin!.
Perelelî xeta kurtêlxwar, li aliyê dîtir ê welêt berxwedan û vîna gelan bi xwînê dihatin neqişkirin. Bi serperştiya vîna gelan a Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê, îradeya kurtêlxwar di şexsê çeteyên DAIŞ de hate şikênandin. Di şiklê rêveberiyên gel ên demokratîk de vîna gelên Sûriyê û bi taybet zarokên Deraa'yê weke xeteke şoreşger a serkeftî hate tesbîtkirin. Bi mîrateya şoreşwarî ya berxwedana li dijî faşîzmê agirê şoreşa gelên Sûriyê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdarbûna hemû pêkhateyên welêt, geş û gur bû.
Her hal serketina xeta demokratîk û projeya gelan a azadî, wekhevî, edalet û serxwebûnê li kêrî herdu rikberên desthilatdariyê nehat. Ji lew re yekîtiya xwe ya kestel li beramberî vîna gel ava kirin û bi hev re berê xwe dan îradeya gelan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Lê dîrok jî tivî kiriye ku xeta "ezben" ti carî serneketiye û her bi bermahiyên sifreyan fetisiye. Serkeftin tekûz şansê têkoşîna gelan e.